

# Me bak ji ber serê xwe berda



---

Zinar Mistefa



**Navê pirtûkê: Me bak ji ber serê xwe berda**

**Nivîskar: Zinar Mistefa**

**Tîplêdan: Nîhad Îskan**

**Çapxaneya Şam – Qamişlo - 2015**

Institut kurde de Paris

## Me bak ji ber serê xwe berda

Me çar hevalan: Ez û Seidûn Seidûn, rehmetiyê Rizo yê Osê û Ibrahîm Mirad, li hev kiribû ku em herin Mosko pirsra kirîna 2 kolekên bîrên avê<sup>1</sup> yên artiwazî li wê derê bikin.

Dr. Evdê Hacî jî, dixwest here serekî bide zar û zêçên xwe ku li Mosko dijîn. Me dest bi kara xwe kir. Yê ku pesaporta wî neyî çû pesaporta xwe çêkir. Dûvre, me berê xwe da Şamê da em ji xwe re vîza jî ji balyozxana Yekîtiya Sovyet bistînin. Piştî ku me hemû dokûkoment û hewceyiyên xwe yên çûnê pêk anîn, di 27 heyva 10<sup>an</sup> de sala 1991<sup>ê</sup>, em ji Qamişlo derketin, û di qapiyê Nisêbînê re em derbasî sînorê Tirkiyê bûn. Qonaxa pêşî ku divêbû em bibrin da bi rêya bejê em

---

<sup>1</sup>-Ji ber kêmbûna baranê li Cezîra Sûrî, hewceyiyek girîng ji kolana bîrên Artiwazî re çêbûbû. Ji lewma, çandiyar û cotyarên herêmê lez dabûn kolana wan bîran, da pê çandiniyên xwe av bidin. Li Sûriyê, hê bîrên Artiwazî bi kolekên kenvnî-klasîk- dihatin kolan. Lê bi wext re, av kêmbû û çû xwar de. Vêce, pêwîstî çêbû ji anîna kolekên nûjen re ji derveyî Sûriyê, yên ku bîr heta qonaxên kûr di erdê de dikolan.

bighine Mosko, ji Nisêbînê ta Qersê bû. Lewma me li geraca Nisêbînê pirs kir, ka çawa em bighine bajarê Qersê?

Virde û wê de, piştî seetekê ji pirs û bazaran, me her 5 hevalan û mirovekî Ermenî û keça xwe, û 2 kesên Çerkezî jî, ji xwe re Dolmîşek<sup>2</sup> heta Qersê bi 225 dolarên Emerîkanî girt.

Xwediyê Dolmîşê û şifêrê wê; derket mirovekî Kurd ji Qurdîsê. Navê wî Şêxo bû. Arîkarê Şêxo di ajotinê de; kurê xwiha wî bû. Navê wî jî Evdê bû. Şêxo Dolmîş qeliqand û me da rê. Berê, ez 2 caran di salên 1969<sup>an</sup> û 1983<sup>an</sup> de çûbûm Tirkîyê, lê rêya ku em vê care tê re diçûn ne rêya berê bû. Şêxo em di wê rêya nû re ku raserî dehla Bûnisra û çemê Ceqceq dikeve birin.

Em ketibûn neqebeke kûr û dûvdirêj de ji neqebên çiyayê Torê. Di wan 40-45 deqîqeyên ku em di nava wî çiyayî re çûn beriya em bighin Midyad û Estelê, ez ketibûm mitale û xiyalên xwe de. Her û her çavên min di pencera Dolmîşê re li derve bûn.

Min li dehlê û wî çiyayî dinhêrt. Dihatin bîra min gotinên yixtiyaran, ku behsa fêkiyê dehla Bûnisra

---

<sup>2</sup>- Dolmîş: Mîkrobaseke piçûk (servîs)

dikirin, yê ku etaran li ser keran tanîn li wan gundên beriyê difirotin.

Çiyayê Torê (çiyayê Kurdan); ku her û her min berê xwe didayê de gava ez ji gundê xwe "Xanaserê" dihatme Qamişlo. Yan jî, ez berûvaj ji wir divegerame gund. Di wan deqîqeyan de, min nedikaribû berê xwe ji pencerê biguherim!. Wan kend û kortan, yan jî ez bibêjim wê coxrafiya piçûk ji xaka welatê min, taze taze ez xistibûm bin bandora xwe de. Eha ji wir û pêde; xweşbûn û zehmetî û romansiya çûna me ya Mosko xuyakir.

Dolmîşa me hêdî hêdî ser wê rêya çiyayî hildikşeha banî. Nêzîkî rê, me xanîkekî şewitî dît. Ji nişkave, Şêxo got: Beriya 2 rojan, zarwan êrîş berdane ser vê noqteya leşkerî û ew wêran kirin!

Se'dûn pirsî: Zaro kîne?

Şêxo got: Apoçiyar...Apoçiyar êrîş kiribûn ser wî cihî!.

Lê Evdê, qîma xwe bi gotinên xalê xwe ne anî. Hêdî hêdî û bi bêhneke fereh wî got: Bi xudê tiştê li wir ne qewimye!

Me naskir ku Şêxo meyildarê PKK yê, lê Evdê ne weke wî difikire.

Neyse, em bi rêya xwe de çûn heta em gihane Midyad û Êstilê. Herdu gund, yan jî herdu bajarok gihabûne hev. Em derbasî Midyadê bûn, û di Êstilê re derketin. Raste ew cara pêşî bû ku em di wan herdu bajarokan re derbasdibûn, lê Êstil û Midyad li ser me ne biyanîbûn. Çiku me gelek Êstilênî û Midyadî li Qamişlo nasdikirin. Ji wir, Şêxo berê Dolmîşê da bajarê Batmanê. Bi rê de, me gundekî eserî dît. Di binya wî re, çemek diherikî. Rizo, yê ku di rex şifêr de rûniştî bû, pirsî : Ev çiyê? Ev kû dere ?

Şêxo got: ev Heskîfe!, ew jî Çemê Dicleye!. Belê, em di ber wî bajarê dîrokî re dibhûrîn, ku xelkê berî sedên salan medeniyeta xwe bi awakî qayim, tekûz, û sipehî di tehtên çiyê de kolabûn. Hê dinya rehnîk bû, em gihane Batmanê. Lê me rêya xwe bi bajêr ne êxist. Tenê em derbasî benzînxaneyekê bûn, ji boyî dagirtina banzînê. Em tevde ji Dolmîsê peyabûn, da em hinekî bêhna xwe li derve berdin. Hevalê me Ibrahîm çû telefonî bajêr kir. Herwesa , heval-rêyê me yê ermenî jî çû telefon kir. Piştî 15 deqîqeyan, mirovên wan herdiwan hatin. Ehlên Ibrahîm; derketin

ji mala Şikriyê Emînê Perîxanê. Keça Şikrî, Naciye Xanim û mêrê xwe û kurê xwe yê 16-17 salî hatin. Nêzîka çarîkekê herdu alî li hev civiyan.

Naciye Xanim li Sûriyê hatibû dinyayê. Bapîrê wê Emînê Ehmed, piştî şoreşa Şêx Se'îd Efendî sala 1925<sub>an</sub>, weke gelek gîrgîrekên kurdan binxet bûbû Kurdistanê Sûriyê. Lê Emîn li wir domnekir. Ketibû serê wî de, ku Tirk he he 'efwa wî derxin. Lê tirkên bextreş, li soza xwe quliptibûn û di sala 1933<sub>an</sub> de, ew bi bêbextî kuştibûn.

Durist bû biryara Şikrî yê Emîn, ku bi bavê xwe re nevegereha bû serxetê<sup>3</sup>. Ew li binxetê<sup>4</sup> ma bû heta sala 1953<sub>an</sub>. Wê çaxê guhertinên mezin li Tirkîyê çêbûbûn. Rehmetiyê Ednan Menderes û partiya xwe ya Demokrat di hilbijartinên sala 1950<sub>î</sub> de bûbûn

---

<sup>3,4</sup>- Serxet û binxet : Di encama peymanê "Sayıks-Pîkot" sala 1916<sub>an</sub> di navbera dagirkerên : (İngilîz, Firansawî, û Rûsan de), Kurdistan hatibû parçe kirin û milletê kurd bêpar û bêdewlet mabû. Piştî parçekirina Kurdsitanê ser xartê, Firansa ku Sûriyê xistibû bin mandata xwe de, û Tirkîyê ku wêrisê dewleta Osmanî bû, dest bi danîna xeta wî sînorî di navbera xwe de kiribûn. Di encamê de, kurdên wan herêmen hidûdî ji hev veqetehabûn. Behrek ji wan mabûn li jorê wê xetê (li Serxetê). Ew bûbûn welatîyên Tirkîyê. Behra dîtir ji wan, mabûn li binê xetê (li Binxetê). Ew vêce bûbûn welatîyên Sûriyê. Û wilo binavkirina serxet û binxetê derkete holê.



desthilat û Îsmet Înonu ji ser hikim ketibûn. Nisbetî wan Tirkên dîtir, hikûmeta Menders cihê baweriyê bû. Lewma jî, hinga Şikriyê Emîn di sala 1953<sup>an</sup> de tevlu zar û zêçên xwe vegerehayî welêt, tu astengiyên wilo zor ne hatibûn serê wî.

Şêxo rehit bû. Wî digot: Derenge de em herin, û derenge de em herin. Vêce, me û mirovên xwe yên serxetî xatir ji hevdu xwestin. Evdê jî cihê Şêxo di ajotina Dolmîşê de girt, û ji wê benzîn-xanê me berê xwe da bajarokê Weyis-elqeran.

Reşatî ketibû erdê de, û hino hino dinya tarîtir dibû. Em qederekê çûn. Ji nişkave, Şêxo got: ev Bişêriya xwar e!. Dûvre, Şêxo got: ev jî Bişêriya Banî ye!. Me bi xwe Bişêrî nasdikir, lê ne ev herdu Bişêriyên ha bûn. Li vir, ez behsa Bişêriya Qamişlo dikim, ku wan koçberên kurdên mesîhî, yên ku beriya 60-70 salî terka welatê xwe kiribûn, navê gundê xwe yê serxetê li tara xwe ya Qamişlo kiribûn.

Em gihane Weyis Elqeran. Di cih de jî, em ji Dolmîşê peyabûn û me pirsaxwarinekê ji xwe re kir. Bakî sar li wir dihat. Ji serma û nêza ez dire'lîm. Em gerehan û ne gerehan, lê me xwarin-xaneyeke vekirî ne dît.

Se'dûn û Rizo çûn hinek nan û penîr û şîrê di qotîkan de anîn . Me xwar û hinekî me xwe rehetkir, piştire me rêya xwe berdewamkir.

Ji weyis-elqeranê me da ser rêya Bedlîsê, ku 57 Km jê dûr diket. Qonaxa destpêkê ne têde, lê piştire rê ne xweş bû. Ew rê di nava çiyayên bilind û raserî newalên kûr re derbas dibû. Xuya bû ku wê êvarê gelek baran li wê herêmê barî bû. Di encamê de, heriya çiyê hatibû xwar ser rêya qîr û zivt. Dolmîşa me vêce carna ser wê rê yê batanaş dikir. Bellî bû ku ji wê rêya teng pêve tu rêyên dîtir li wê deverê ne bûn. Çiku ne tenê tirimbêl, lê belê pez û sewal jî di wê rêyê re diçûn. Dolmîşa me bi deqîqeyan dirawesteha gava kiriyên pêz derdikene pêşiyê. Li ser rêyên wilo, ajotin pir zehmete. Lewma, divêt ku bêhna şifêran fereh be. Evdê dajot û şifirtiya wî baş bû. Lê xalê wî Şêxo ji ajotina wî ne razî bû. Her kêlîkekê wî dibakiryêde: lawo Evdê, rehet bajo, rehet bajo!

Lê ya rastî, Şêxo pispor bû di naskirina herêmên ku em di nav wan re derbas dibûn. Di wê rêyê de, wî

tişteki girîng şanî meda. Gava em gihane deverekê, Şêxo bakir: vaye, vaye, vaye "kevir ê qul"<sup>5</sup>!

Min li ser kevir ê qul ji bavê xwe (Mistefa Mihemed-Reşad Zaza) bihîstibû, ku di sala 1933<sub>an</sub> de binxet bûbû Kurdistana Sûriyê. Lê tiştta me dîtî kevr ê qul nema bû weke berê; ku insan û heywan û 'erebe di bin re diçûn. Çikû ew nîv xeleka kevirî ji banî ve herifî bû, û bi tenê herdu stûnên wê (rayên wê) ma bûn. Belê , me kevr ê qul jî dît , û em di nav herdu stûnên wî re derbas bûn.

Evdê ajotina xwe berdewam kir. Bellî bû jê ku ew mirovekî bêdeng û di heddê xwe de ye. Bi gotineke dîtir, bêhtir rengê zane û efendiyan lê diket. Bi ser ku wî ji dibistana ortê pêve tu xwendin nekiribû. Lê li xalê wî Şêxo, bêhtir rengê gundî û folklorî diket. Ew mirovekî: sade, germ, û comerd bû.

Seet li dora nih û nîvan (21:30 deq), em gihane Bedlîsê. Lê bes em di nava bajêr re ne çûn. Li binya newalekê nêzîkî bajêr, polîsan em sekinandin. Piştî ku naskirin em rêwiyên biyanîne, wan doza pesaportan li

---

<sup>5</sup>-Di cenga cîhanê ya yekê-salên 1914-1918<sub>an</sub> de, eskerê Rûs gihabûne wê deverê.

me kirin. Min hinekî bi tirkî dizanîbû, lewra min fêhim kir çi ji Şêxo dipirsin. Yekî ji wan polîsan ji Şêxo pirsî: Onlar la tabanca var mı<sup>6</sup>?

Şêxo bersiv da, go: Hayir abi. Onlar turist. Rusya ya gidecekler. Rusya ya gidecekler <sup>7</sup>!

Polîsan inza çûnê dane me. Evdê Dolmîşa xwe ajot, û me da kaş û em ji wê newalê derketim.

Dûvre, em li ber xwarin- xanekekê rawestehan da em şîvekê bixun.

Em cemidîn heta ku em ji dolmîşê derbasî hindirwê xwarin-xanê bûn. Çiku sireke dijwar wê şevê li wan zozanan dihat. Coxrafiya wê herêmê û av û bayê wê, yekcar ne weke ya Cizîra me ya Sûriye bû. Heke beriya 10 seetan dinya li Qamişlo xweş û sayî bû. Li vir zivistaneke zivistan bû.

Belê, Kurdistan welatekî mezin e. Wê rewşa hewayê jî, lê neweke hev be!

Em her 5 heval li xwarin-xanê li dora masekekê rûniştin .Destpêkê şagirtiyên xwarin-xanê bi dehşet li

---

<sup>6</sup>- Ma dermance bi wan re hene?

<sup>7</sup>- Ne xêr ezbenî . Ew geştokin. Wê herne Rûsiya yê, wê herne Rûsiya yê!

me meyzandin .Qey zarwan dixwestin bizanibin ka em kîne?!. Gava naskirin ku em kurdin û ji Sûrî hatine, gelekî keyfa wan hat û qedir û siyaneta me girtin. Wan zarwan kebabne xweş ji goştê pezê çiyê ji me re çêkirin. Me çayê jî li nik wan vexwar, û me hesabê xwe da û em meşîn.

Me hew pirsî ka berê Dolmîşê bi kû ve ye. Hemû mabû bi hêviya Şêxo ve, ku serkirdayetiya Dolmîşê careke dîtir ketibû destên wî de. Em gelekî dûr ne çûn, kîlometrekê–didwan ne bêhtir. Dûvre, 2 rê li pêşiya me derketin. Yek jê li ser destê rastê ber bi rojhilat ve diçû. Ya dîtir; li ser dest çepê ber bi bakur ve diçû.

Şêxo ji kel diçû. Xuya bû ku mêrik şelişî û hew dizanîbû bide ser kîjanê ji wan her du rêyan. Ji nişkave, Şêxo ser milê çepê şikand û da ser rêya bakur. Dolmîşa me çû û hat, û çû û hat, dûvre bi aliyê rastê ve meyil bû û kete şerempo ya rêde. Ya rastî em gelekî tirsehan, çiku Dolmîşa me ber bi qulbandinê ve diçû. Lê Xudê Te`ala em sitirandin û Dolmîş ji şerempo yê ne derket heta ku ji xwe re sekinî. Di nav wê tirsê û rewşa xirab de, kenekî 'ecêb em girtin. Wekat ew ji keyfa dihat, ku em hemûçik sax-silamet ji

wê qazayê filitîn. Em ji Dolmîşê derketin û hêdî hêdî me ew ji wê şerempoyê derxist. Tişteke bi wan çenteyên me yên ku li ser serê wê bûn ne hat, û weke berê ew girêdayî mabûn. Sedema wê qezayê ew bû ku ew rê ne zift kiribû, û bi tenê sêlak û mêlak û nizanîm çî li ser hatibû raxistin. Bi ser wilo ve jî, wê şevê gelek baran li wir barîbû û rê hemû bûbû herî û şemîtonk. Vêce hingê Şêxo xurt diçû, wî nasnekir ku rê ne çêkrye. Şensekî mezin bû ji me re ku ew qeza li dereke rast qewimî. Lê ku li wan çiya û newalên beriya Bedlîsê çêbûbane? bêgoman yekî tenê jî Ji me sax ne difilitî ! Tu derên Dolmîşê neperçiqîn, tenê meqesa wê şikest. Şêxo aciz bû û pitpit dikir. Lê tişteke bi destên wî ve ne dihat ji bilî ku çûna xwe berdewam bike.

Em li dolmîşê siwar bûn, û Şêxo berê wê guhert û da ser wê rêya dîtir ku diçû Tetwanê. Ji ber şikestina meqesê, Dolmîşa me hew karîbû weke berê xurt here. Leza wê mabû li dora 50 km/set. Axir, seet 12 yê nîvê şevê em gihane "Tetwanê".

Gelekî dereng min bihîstibû ku Tetwana me kurdan jî heye. Berê min Tetwana ereban ya ku li Muxribê dikeve nasdikir. Lê di 17-yê heyva 1-ê de, sala 1991î.

Ango di wê roja ku hêzên hevpeymanan navnetewî dest birizgarkirina Kiwêtê ji bin destên Faşîst û dagirkerên Seddamiyan kiribûn, navê Tetwana Kurdsitanê di Radyo û televizyonan de hatibû weşandin. Nûçeyê digot: Li bajarê Tetwanê, ku li rojhilatê Tirkiyê dikeve, bi sedan kes rabûne ser xwe êrîşa hêzên hevpeymanan navnetewî ser ordiya Eraqê protêsto dikin.

Hingê min ji xwe dipirsî: Tetwan! Gelo ma bajarekî bi wî navî li nîk me li Kurdistanê heye?

Dûvre, ew kîne yê ku li kolan û celdeyan protêsto dikin?

Helbet bi min gelekî ne xweş bû ku hinek kurd ser qesas û dijminê milletê xwe re werin. Nexasim ku gelê kurd li hêviya wê seetê bû ku hêzên hevpeymanan li Seddam Hisên û rêjîma wî ya "Basiya faşist" bixin. Dewelt serê wan hêzan jî, ordiya Seddam di Kiwêtê de têk çûbû. Û piştî serhildana Kurdan di adara sala 1991î de, behreke mezin ji erdên Kurdistana başûr hatibû rizgarkirin. Ew cara pêşî bû di dîroka nûjen de, ku kurd li parçeyekî ji her çar parçeyên Kurdistanê azad dibin.

Bêgoman rêjîmên desthilat li Kurdistanê ne razîbûn ji wan guhertinên girîng ku li Eraqê çêdibûn. Hê ji wilo bêhtir jî, wan bi kîn û buxz û çavê dijminatîyê berê xwe dabûne hikûmeta herêma Kurdistanê. Lewra jî, pêwîste ser me Kurdan ku em bêhtir hişyar bin û hew bi soz û derew û hîleyên dijminan werin xapandin. Dîse jî, ferze ser me ku em piştta hevdu bigrin ji boyî azadî û serxwebûna welatê xwe.

Em ji Tetwanê derketin bêyî ku em meqesa Dolmîşê çêbikin. Şêxo kir û ne kir, lê di wê nîv-şevê de tu mîkanîk bi dest ne ketin. Piştî ku em qederekê çûn, em rastî aveke mezin hatin. Min pirsî : Ev çi ave?

Şêxo got: Ev "Behr a Wanê ye"!

Matmayî û şa, min dîse pirsî: Ev e "Behra Wanê"?!

Şêxo tekez kir û got: Belê, ev e "Behr a Wanê"

Behr a Wanê, berê hevalan hemûkan kişande xwe. Min ji xwe re digot: Ne xwe em di ber "Behr a Wanê" re diçin?!. Ew Behra ku min hejê dikir bêyî ku ez wê bibînim! Ew Behra ku gelek helbest û sitran û çîrok ser hatine gotin ! Ê heke ku Behr a kurdan ya vekirî



nebe jî, lê Behr a Wanê ber dilê wan pir ezîz û bihagiran e !

20 deqekî em di ber Behrê re çûn. Wê şevê taveheyiv bû. Vêce ji si'ûda me rêwiyan bû ku em wê avê çêtir bibînin. Hino hino em ji ber Behr a Wanê dûr diketin. Rê ya ku em têre çûn, di nava deştekê re derbas dibû. Lê mixabin, ew wilqasî ne ava bû û tu gundên mezin û boş me li wê derê ne dîtî. Bi tenê, em pêrgî gundikne piçûk bi rê de hatin. Ez ji xwe re diponijîm, û min di dilê xwe de digot: yaho çima ev welatê sipehî, xweş, û zengîn wilo ne ava ye?!

Dîse ez li xwe vegereham û min ji xwe re got: Wekat ev deşt berê ava bû, û xelk û gund tê de hebûn. Lê ew xirabûne û valebûne ji ber sedema polîtîka qirkirin û mehûkirinê ku dewleta Tirk dehên salan dijê gelê kurd li Kurdistanê bakur pêk anîbû!

Piştî wê deştê, em qonaxeke baş di deverên asê re (çem, newal, û çiya) derbas bûn, û di seeta 2-an de piştî nivê şevê, em gihane bajarê "Agirî" ku nêzîkî sînorê Iranê dikeve. Wê seeta dereng, bajar razayî bû. Li celdeyên Agirî em rastî kesî ne hatin. Ji benzîn-xana Batmanê ta Agirî, Dolmîşa me gelek benzîn

şewitandibû. Lewma, Şêxo çavên xwe li benzîn-xanekê digerandin qene Dolmîşa xwe ji benzînê dagire. Axir, li derveyî bajêr, em derbasî benzîn – xaneyekê bûn. Lê me kir û nekir, karkerê wê, benzîn ne da me. Ji xwe wî derî ji me re ne vekir.

Ji hindirû ve “pişt came”, wî êşareteke neyînî dida. Weke ku digot: Nîne, nîne, benzîn nîne!

Xuyadikir ku mêrik di tirseke mezin de bû. Lewma wî ne diwêrbû derî veke. Em kêlîkekê li wir man, me got belkî benzînê bide me, lê bizavên me hemû vale çûn.

Bêşik, heq bi karkerê benzîn-xanê re hebû ku benzîn ne da me. Çiku di rêjîma şixulê benzîn-xanan de, ji mafên karkerên waye ku piştî nivê şevê firotina petrolê rawestînin. Lê di baweriya min de, sedema herî girîng ku wî karkerî benzîn ne da me, hebûna tirs û kuştinê bû li Kurdistana bakur, û nexasim piştî ku şer di navbera partiya karkerên Kurdistanê "PKK" û dewleta Tirk de, ji boyî mafên gelê kurd destpêkiribû.

Piştî ku Şêxo hêviya xwe ji standina benzînê qut kir, wî gote Evdê: Ka here bajo, ka here bajo! Emê tewekilê ser xudê Te'ala bikin. Heke benzînê têra me kir, û heke em di rê de man?

Serkirdayetiya Dolmîşê ketibû destên Evdê de. Herdu şifêrên me “Şêxo û Evdê” Dolmîş bi dorê dajotin. Qeza ku bi me re qewimî ne têde, lê herdu jî di ajotinê de hoste bûn.

Dolmîşa me diçû û ji bilî min û Evdê yê şifêr pêve, tu kes şiyar ne bû. Di seferê de, ez kêman dirazim. Ê nexasim di tirimbêlê de, ku ez nikarim rehet binivim. Bêhtirî 2 seetan Evdê ajot. Piştî, seet çar û nîvê sibihê, wî hevsarê ajotinê radestî xalê xwe Şêxo kir.

Hino hino dinya zelal dibû. Dîse jî xurista wê devera ku em têre diçûn; çiya û newal bûn. Ji xwe behreke mezin ji coxrafiya Kurdistana bakur di wî nolî de ye. Di wê qonaxa rê de, em di ber 3 gundikên 7-8 malî re derbas bûn. Tu pêjna xelkê û pez û sewalan ji wan deran ne dihat. Bi tenê çavên min bi pîrekekê ketin, ku dewlek av di desta de bû. Rewşa wan deveran; sar û asê û xirab bû. Min ji xwe dipirsî: Yaho! Çawa xelk li van herêmên çiyayiyên bê guhdan debara xwe dikin?

Ew qederek bû ku em derbasî sînorê wilayeta Erziromê bûbûn. Ê seet 6ê sibihê, Dolmîşa me li nava sûka bajarokê Xoresanê rawesteha. Wê sibiha zû, qir bû li Xoresanê. Me tevan sar bû, û em hemû jî piştî

wê te'ba rê birçî bûbûn. Lewma, me pirs a taştêyekê ji xwe re kir. Lê wê seeta zû ji sibihê, ti xwarin-xane û dikan li wir vekirî ne bûn. Bi tenê li qewhe-xaneyeke piçûk, ku nûka sopa xwe ya li ser êzingan germ dikir, qedehek çayê bi dest me ket.

Seet bûbû heft. Şêxo û Evdê çûn pirs a mîkanîkekî bikin da meqesa Dolmîşê çêbike. Em jî derketin ser xwe bigerin heta xwarin-xane vebin. Min pirsin ji hinekan kirin, lê wan xwe xaşo-maşo kirin û xwe li zimanê kurmançî ne kirin xwedî. Me got: Qey xelkên vî cihî ne kurdin bavo?!

Dûvre, em dûrtir çûn, heta ku em di sûka pêz û sewêl re derketin. Destpêkê 2-3 kes li wir hebûn. Piştî xelk hatin. Wan pez û sewalên xwe tanîne firotinê. Sûk hate dagirtin û bazarê bi kurmançiya gewir û bi 'irif û adetên bazirganên, ango (bisilavê û desthejandinê) destpêkir. Pir keyfa me hat û me gote hev: Vaye, xelkên vê herêmê Kurdin !

Seet heşt xwarin-xane vebû bûn. Em jî çûn li yekê ji wan rûniştin. Taştêya wan: (Nan, penîr, mast, nîvişk, hingiv, zeytûn, çay, û şorb a nîskê bû). Xwediyê xwarin-xanê kurd bû, lê wî bi kurmançî ne dizanîbû.

Lewma jî, wî navên wan xwarinan bi tirkî ji me re xwendin. Gava mêrik giha ser navê şorb a nîskê, wî got: "Mercimk çorbasi" !

Se'dûn ji min pirsî: Vî çi got?

Min lê vegerand: Dibêje ku şorb a nîskê jî heye. Se'dûn dîse pirsî : Wî bi tirkî çi got?

Min gotiyê: Navê wê bi tirkî " Mercimk çorbasi yê"

Se'dûn got: Na, ne wilo ye. Navê wê "Ricûm e" !

Min jê pirsî: Ma te ev nav ji kû aniye?

Se'dûn got: Ez dizanim ku navê wê ricûm e !

Xwediye xwarin-xanê pirsî : Ev çi dibêje?

Min gotiyê: Heval ê me dibêje ku navê wê ne "Mercimek çorbasi" ye, lê belê "Ricûm e" !

Pirqênî bi mêrik ket û got : Wellehî ev xweş bû. Min bi xwe jî ew tişt nizanî bû !

Vêce, em bi kenê mêrik kenîn.

Se'dûn rabû got: Yella yella, bila wê ricûmê bînin !

Se'dûn henek û tinaz dikirin, qene em bikenin û şa bibin.

Ezbenî ! taştêya me hat, û weke se'dûn dixwest, ricûm anîn. Piştî ku me xwar, me perekê mêrik danêde û me bexşîşa gersonan jî da wan, û em rabûne ser xwe û ji xwarin-xanê em derketin.

Vêce, me qista Dolmîşa xwe kir, ku li dikaneke mîkanîkan nêzîkî sûka pêz dahate çêkirin. Şêxo û Evdê li wê derê bi çêkirina meqesê ve mijûl bûn.

Seet nih û nîv, Dolmîşa me amade bûbû ji çûnê re.

Şêxo 10% ji kirêya ku ji me standî danî ser çêkirina wî meqesî. Vêce, wî bi xemgînî digot : Di vê hatinê de ez xisirîm!

Şêxo ajot û me da ser rêya Qersê. Serma sibihê çûbû û rewşa bayê xweş bûbû. Dinya sayî bû û ezmên şîn dikir. Ji pencer a Dolmîşê ve, me sûret û dîmenên xiyalî didîtin, û ne xasim “çiyayê sîpanê xelatê” ku ji dûr ve xuya dikir. Rizo, ku bû wê dîtinê hêrs û geş bûbû, got: Bi xêra vê gera me ya li Kurdistana bakur, me sîpanê pîroz jî dît!

Bi rastî, ew bextweriyeke hêja bû ku em sîpanê bi heybet bibînin. Ew çiyayê ku simbole ji bilindayî û mezanyîyê re. Û ew çiyayê ku kurdan gelek çîrok û destan ser gotine.

Dolmîşa me diçû û hey diçû. Em ketibûne qonaxa paşî de ji wê rêya dûvdirêj, ku me ji Nisêbînê destpêkiribû. Çavên me her (9) rêwiyan û helbet yên Şêxo û Evdê jî li ghiştina Qersê bû, ku rêwîtiya me ya bi Dolmîşê li wir bi dawî dibû.

Beriya nîvro, em gihane Qersê. Em û dolmîşa xwe li wir ji hevdu veqetehan. Me sipasiya Şêxo û Evdê ser hevaltiya rê- ya xweş- kir. Her çar hevalrêyên me, yên ermenî û çerkezî jî bi rêya xwe de çûn. Ew mirovne rehet û bê deng bûn. Gelek baweriya wan xelkan bi hevaltiya me hebû. Lewra jî, piştî wan di wê seferê de bi me xurt bû.

Em li otêleke destê navê peyabûn. Ez û Dr. Evdê ketne odekekê de. Se'dûn û Rizo ketin yeke dîtir de. Oda sisyan ku bi yek textî bû, ma bû ji Ibrahîm re.

Hê me çenteyên xwe ne vekirî bûn ku em hinek hewceyîyên xwe ji wan derbixin, yekî bi ser me de girt. Ewil-karekê, me got qey ew yek ji wan

berpirsiyarên otêlê ye. Çiku mêrik got: Ez hatime binêrim ka çi arîkarî ji we re gereke?

Min bi tirkî ji mêrik re got : Tiştekan ji mere ne lazime.

Lê mêrik dev ji me neqereha û got: Ê ê ê, ka hûn çi emir dikin?

Dîse min gotiyê de: Ezbenî, em tiştekanî naxwazin, û tu hewceyiyên me nînin!

Ew guft û go min ji hevalan re diwergerande kurmancî.

Rizo got: Belê belê, em birçîne. Bêjiyê bila xwarinxaneyekê şanî me bide!

Min ji mêrik re got: Zaro birçîne û dixwazin bixun.

Di cih de jî, wî got: Fermokin !

Bi rê de, mêrik pirsî: Hûn dixwazin çi bixun?

Min gotiyê de: Birinc û tirşik, yanî xwarinên wilo germ.

Li aşxanekeke paqij, em her şeş li dora masekekê rûniştin. Min û yê tirk bi hev re da û stand. Dr. Evdê pirsî : Ew çi karî dike?



Mêrik behsa xwe kir: Ku ew gumrikçiye. Û bi 'eslê xwe, ew çerkezîye. Herwesa wî got ku, mala wî li Stembolê yê, lê ew li Qersê wezîfeya xwe di gomrikê de dike.

Ji nişkave, Ibrahîm got: Gumrikçiye? Derew !

Bi qesem ew Muxbirçiye!

Yê tirk pirsî: Ew çi dibêje?

Min lê vegerand: Ewtîstekî nabêje, ew tiştekî nabêje!

Mêrik gumrikçî bane? Yan jî muxbirçî bane? Qet ne xem bû ji me re !

Xwarin hat. Me xwar û vexwar. Helbet mêrik jî bi me re xwar, û wî qedehek araq jî vexwar. Piştê Rizo<sup>8</sup> heqê sifrê jî da, û me da xwe em ji xwarin-xanê derketin. Lê mêrik dev ji me ne qereha û got ezê we paşê bibînim.

Em jî vegerane otêla xwe, qene em hinekî ji wê ta'ba rê xwe rehet bikin.

---

<sup>8</sup>-Maliya me hemû bi hêviya Rizo ve mabû

Êvarkî piştî şîvê, yê "Qaşo gumrikçi" hat xwe li nik me kire mêhvan. Virde û wêde, gotinek ji vir û gotinek ji wir, wî dixwest me bikşîne şitexaliyê. pêşî mêrik behsa pêşketin û demokarsiyê li Tirkiyê kir. Piştî, ew dûvdirêj ser karîzma serok "Turgut Ozal" û rola wî ya erênî di serkirdayetiya Tirkiyê de rawesteha. Herwesa, wî xwe berda Sûriyê û serê me bi pirsê xwe : (Jiyana we li wir çawaye? Ê rêjîma "serok Esed" biwere çawaye? Ê nizanim çi çawaye?) gêjkir.

Se'dûn gote min: Bêjîyê besse ! Wî serê me bir ! Tirra serokê wî û tirra serokê me ! Wehh ! Em hew dikarin xwe ji vî sedê û bavî xilas bikin, bavo?! Bi wê zirt û qerebalixa Se'dûn, mêrik hewhiwî û hew wistênî jê hat.

Em kenîn, û ma îde me kenek kir?! Yê tirk fihêtkar bû û li ber xwe ket. Beriya ku mêrik ji cem me here wî doza kîlokek çayê li me kir.

Lê tevde- mevde, me 2 kîlo çayê bi xwe re anîbûn.

Vêce, me liqayî (100 g) çayê û hinek çeçolat-meçolat danê de. Ji kinarê xwe ve, wî soz da ku di gumrika sînorê Tirkiyê bi yekîtiya Sovyet re arîkariya me bike.

Wê şevê, em dereng şiyar ne man. Hingî em westeha bûn bi rê de, û sibiha dîtir çûna yekîtiya Sovyet li pêşiya me bû, her yek ji me çû kete nav cihên xwe de.

Sibihî, seet heft û nîv, em ji xew şiyar bûn. Ewilkê me tişt û mişt û çenteyên xwe dane hev. Dûvre, me parîk nan kire ber dilê xwe de, û me hesabê otêlê da û em derketne derve de em herne stasiyona tirênê. Stasiyon ne dûr bû, lewma hevalên me bi meşê çûne wir. Ez û Rizo mane li ber çenteyan. Wê kêlîkê, tu tirimbêl bi dest me ne ketin. Lê erebekeke dewaran, ku sîpekekî 13-14 salî li ber bû, nêzîkî me rawesteha bû. Min ji Rizo pirsî: Ka em çenteyên xwe bi vê erebê bibin?

Rizo got: De ka bêjyê!  
min rabû ji kurik bi tirkî pirsî : Ma tu çenteyên me nabî stasiyona tirênê?

Kurik got: Belê, ezê we bibim!

Me û wî li ser kirêya erebê li hev kir, û me çenteyên xwe barkirin û em meşîn.

Bi rê de, hate bîra min ku ez kurkê erebeçî bipirsim ma tu ne kurdî?

Kurik wilo ne biste got : Belê ez kurd im!

Vêce, min jê pirsî: Gelo ma tu bi kurmancî dizanî?

Kurik got: Erê ez dizanim!

Gelek keyfa min û Rizo hat, ku wî kurikî zanîbû bi kurmancî biştexle. Çiku piştî rojekê ji mana me li Qersê, me kurdî tenê ji devê wî sîpeyî bihîst. Me zanîbû ku li Qersê ne tenê kurd hene, lê belê Tirk û neteweyên dîtir jî hene. Lê tişta 'ecêb û ne normal ew bû; ku me ne dît kurd bi zimanê xwe yê dayikê li wir biştexilin?!

Çiqasî keyfa me hat ku ew sîpeyê erebeçî bi zimanê xwe yê zikmakî diaxivî, wilqasî jî dilê me bi belengaziya wî rebenî şewitî. Lewma, gava Rizo ji min pirsî: Ma em çiqasî bidnêde?

Min jê re got: Çiqasî pereyên zêde bi tere hebin bidyêde!

Rizo ne merdî nekir. Wî sêqetî heqê kirya wî sîpeyî dayê de.

Li stasyonê, em û hevalan gihane hev. Gerek tirêna me seet 9:30 deqe ji cih qeliqîbane. Lê li gorî

bernameya çûnê, ew 2 seetan dereng mabû. Vêce heta ku tirên amade bû, em ji xwe re li stasyonê mijûl bûn û me hinek xwarin kirî qene em bi rêde bixun. Li wir, me hemmalek û dikandarekî kurd naskirin. Herdu bi me ve man, û herdu jî ji me re bêtexsîr bûn. Raste yê dikandar bi kurmancî ne dizanîbû, lê ew mirovekî dilovanî û welatparêz bû. Wî di nav min û xwe de – hinekî bi pirs- got: tu dizanî em di hibijartinaên parlamana de beriya çend rojan bi ser ketibûn?

Min gotiyê: Erê, ez zanim!

Yê dikandar behsa hibijartina 21 parlamanterên kurd: Ehmed Turk, Leyla Zana, Xetîb Dîcle, Selîm Sadak; Orhan Doxan û hevalên wan ji partiya DEP ê fikir ku di hibijartinên dawî de bûbûne nûnerên gelê kurd di parlamanta Tirkiyê de. Seet 11:30 deqîqeyê nîvro, tirêna me ji stasyonê qeliqî û hêdî hêdî em ji bajarê Qersê derketin. Ew qonaxa paşî bû ku me li ser rêyên kurdistana Bakur dibirî beriya em bigihine sînorê yekîtiya Sovyet.

Ew herdu rojên ku me li ser rê û di nava deşt û bajarên kurdistana jorîn de qedandin ji bîra min

naçin. Belê, Bakurê welatê me xweş û zengîne bi av û çem û deşt û zozanên xwe û gelek tiştên dîtir. Lê mixabin ku ew welat ji aliyê nijad-perestên Tirkan ve bê guhdan û wêran maye. Lê di baweriya min de, tišta xirab û şerma herî mezin ewe; ku behreke ne hindik ji kurdan li wan herêman bi zimanê xwe napeyivin. Helbet ew encameke xirabe ji wê polîtîka şovînîst re ku dewleta Tirk dehên salan li Kurdistanê ajotibû. Lê di heman demê de, gazinekî mezin li Kurdan bi xwe dikeve û nexasim li yên bajarî ji wan, ku li xwe nanihin bi Kurdî biaxivin û bêhtir hêz û hemeta xwe berdane ser zimanê tirkî. Ê weke ku tê zanîn; ziman xala bingehîne di hebûna neteweyan de. Lewre, ferze ser me Kurdan ku em bi zimanê xwe biştexilin û wî xweşik fêrbibin, da xelk bizanibin ku em jî xwedî çand û zimanekî kevnare ne.

Li ser vê pirsê giring mamosteyê hêja û damezrenerê partiya Domokrata Kurdî li Sûriyê *Dr. Nûredîn Zaza* gotibû:

*(Gelî Kurdan! Eger hûn nexwazin ji hev tar û mar û winda bibin, berê her tiştî zimanê xwe bixwînin û bidin xwendin. Lê eger hûn dixwazin xwe nas bikin û xwe bidin naskirin û hizkirin, bi hevaltî û dostanîya*

*milletên dî re bi pêş ve herin, û bi rûmet û serbilindî bijîn, dîse zimanê xwe bixwînin û bidin xwendinê).*

Tirêna me di gelek deveran re derbas bû, lê min ew der nasnedikirin. Bi tenê li diryanekê, nave (Sarîqamişê) nivîstîbû.

Ew nav, min di çîroka nivîskarê Kurdê navdar (Erebê Şemo) de xwendibû. Esirkî, tirêna me gihabû noqteya paşî ser sînorê Tirkya bi yekitiya Sovyet re. Ji wir û pêde tirêna Tirkî ne diçû. Vêce, divîbû ku em ji wê tirênê peyabibin û li yeke sovyetî siwar bibin. Ew stasyon hatibû dagirtin ji rêwîyan, çiku gelek misafirên ermenî divegerane mal. Ê me li wê deverê nêzîka 3 seetan dom kir ji ber ku tirêna Sovyetî dereng giha wir. Di wê navê re, me mohra tiranzîtê li pesportên xwe da û herwisa em di keşfa gumrikê re jî derbas bûn. Lê me li wir pêjna gumirkçiyê xwe yê Qersê ne kir, ku Ibrahîm weke (Muxbirçî) ew bi nav kiribû. Xuya bû ku li gorî saxloxa berpirsiyarên otêlê ji emniyetê re, mêrik hatibû ataxiyê li me bike. Piştî ku me hemû rêwîyan cihên xwe di tirêna Sovetî de girtin , seet li dora 6ê êvarê bû, ew ji stasyona Tirkî derket û di cih de jî derbasî sînorê Yekîtiya Sovyet (Ermenistan) bûbû. Çiku stasyon û sînor li wir digihane hev. Tirên

ser erda yekitiya sovyet diçû ku me her (5) hevalan xwendina xwe li wir timam kiribû.

Ew cara pêşî bû ku ez dihatme Ermenistanê. Ji me her (5) hevalan, bi tenê çûn û hatinên Ibrahîm bi ser cîran û gundiyan wî yê ermenî de hebûn, ku di sala 1966 an de, ji gundê Hilko<sup>9</sup> koçberî Ermenistanê bûbûn. Berê me bi Lînîkanê vebû, kû bi hijmara nifûsên xwe ve; bajarê(2) li Ermenîstanê. Û nêzîka seet 9 ê êvarê tirêna me li stasyona wî bajarî rewesteha bû. Me tore û ecêb li wê stasyonê ji aliyê gumrikçiyên Ermenîyan ve dîtîn. Îde ew ne gumirkçî bûn, lê belê ew di nolê muxlaçî û nijdevanan de bûn. Ez bawernakim ku rêwîyek ji wan rêwîyan ku bi tirênê hatibûn ji nav lepên wan şalatiyan bêxisar filitî be! Gava dor hate ser me, em jî xisirîn, û me jî bêşa xwe da. Heval derbas bûn, mame ez. Nizanim çilo, lê mohra Dr.Evdê ya paçvaniyê di çenteyê min de derket! Yekî bêmrês ji wan gumrikçiyên pirsî: ev çi mohre? Min bi Rûsî gotiyê: Ev mohra hevalê mine!

---

<sup>9</sup>-Hilko: gundeke li dora Qamişlo dikeve.



Wî dîse pirsî: Kîjan hevalê te?

Min lê vegerand: Ya Evdê Hacî ye, ku berî çend xeberan di gumrika we re derbas bûbû.

Wî bi kîn û buxz got: Hê navê wî (Hacî) jî ye?!

Vêce min gotyê: Ma te çi ji navê wî ye? Me herdiwan da ber hev û bû qerebalixa me, û tu nemayî ku em biberizne hev. Li ser wê xirecir û qerebalixê, heval hatine bi min ve, û em herdu alî li ber hev sekînin. Ezbenî, gumirkçiyên ermenî ji desthılanîn ketin û mecbûr bûn ku bela xwe ji me vekin!.

Bêguman, meqseda wî gumirkçiyî ji tevdan û hêlemanîya ser wê mohrê ew bû; ku perene zêde ji min bistîne.

Gelekî aciz, em ji stasyonê derketin. Li derve, em rastî herdu heval rê yên xwe yên çerkezî hatin. Zaro gelek rehitbûn, çiku çentekî wan li wir hatibû dizîn. Dr. Evdê got: Dêmek rewş gihaye wê asta xirab li welatê Sovyatan?!

Dr. Evdê gotina xwe berdewam kir û got: Di dema xwendinê de li sovyet, me karên wesa xirab ne dîtibûn! Wê şevê, Ibrahîm berê me da (Aragats) nik

hemşerî yê n xwe. Lê ji ber xetera hovediz û rêbirên li stasyonê, ku amade bûn bidne pey rêwiyên biyanî û wan bişelênin, şifêrê posta ku me kirêkirî em yekser ne birne wir. Camêr pêşî em birne mala xwe li Lênînekanê da şopa me li ber wan muxlaciyan winda bike. Me qehwekek li wir vexwar, dûvre me da ser rê ya Aragatsê, û seet 1 ê piştî nivê şevê em gihane wir.

Wê seeta dereng ji şevê, hemşeriyên Ibrahîm ji ber hatina me ji xew şiyar bûn, û bi comerdî û dilekî fereh em pêşwazîkirin. Lê ji wê mala ku berê bi kufletê xwe yê boş ve ava bû, tu kes ji "Ropên" û xwiha "Arûs" pêve ne ma bû. Vêce, çawa çavên Arûsê bi Ibrahîm ketin, wê ji nişkave bi awakî folklorî û gundî bakir: "Pepûko, Brahîmo, Lawo, tu û van deran?!".

Bi wan gotinên Arûsê yê sade û şîrîn, em hemû kenîn. Heta ku Ibrahîm hew karîbû xwe ji devê me xilas bike. Lê Ibrahîm got: Tekliyên malbata min û vê malê<sup>10</sup> kûrin, lewma ez û wan li hevdu bistene. Ya rastî, li seb xatirê Ibrahîm, wan zarwan em xweşik pêşwazî kirin û gelek qedrê me girtin.

---

<sup>10</sup>-carê Ibarhîm ji min re behsa wê malê dikir.

Ropên û Arûsê cihên me danîn, û ji te'ba rê em zû di xew ve çûn.

Sibihê , piştî ku me taştê xwar, Ropên çû postekê ji me re kirêkir qene em pê herne Yerîvanê. Ew jî weke rêberekî bi me re çû da arîkariya me li wir bike. Ropên xortekî delal û efendî bû. Lê mixabin rewşa jiyana wî û xwiha wî Arûsê ne xweş bû, û nexasim di warê aboriyê de, ku halê wan tenik bû. Bi rê de heta Yerîvanê, wî ji min re behsa kul û derdên xwe kirin. Ropên got: piştî mirina dê û bavê min ne bi gelekî, birayê min ê mezin "Cûzêv" <sup>11</sup> ji ser banê fabrîqa ku têde kar dikir ket û jiyana xwe ji dest da. Di encamê de, pîrek û zarokên wî yê hûr perîşan ketibûn. Vêce feqîrkê Ropên li ber xwe diket ku ne dikarîbû arîkariya wan bike, çiku ew bi xwe bettal û bê kar ma bû. Yerîvan ne dûr bû ji Aragastê. Şifêrê postê em bi seetekê gihandine wir. Li Yerîvanê, em li ber dergihê avayiya stasiyona tirênê peya bûn, çiku me dixwest em bi tirênê herne Mosko. Lê di si'ûda me de, çûn û hatin heta Rûsya yê ji ber sedema şerê di navbera Ermenî û Azirbêcaniyan de qutbûyî bû. Lewma, me

---

<sup>11</sup>-min rehmetyê Cûzêv nasdikir. Di salên 70 yan de, dema ku me li "Bako" dixwend, ew dihate wir nik Îbrahîm

pirsa wastene dîtir ji çûna Mosko re kirin. Mixabin, ji ber gireva karkerên kompaniya "Airo Flotê" <sup>12</sup>, belafir ji Yerîvanê ne dirabûn. Bi rêya bejê jî, tu wasteyên çûnê bi dest me neketin, û em li wir neçar man. Di rewşeke wilo de, ti hewceyiya me bi mana Ropên li Yerîvanê ne ma. Ji xwe îde tiştê ji destên camêr ne derdiket. Lê ji beriya ku vegere mal, wî çû ji mere (200) dolarên emrîkanî guhertine (6000) rûbilên Sovyetî da em xwe bi wan pera biqedînin heta em gihayî Mosko.

Vêce, me weke penaberan xwe li stasyonê girt. Lê gava midûrê stasyonê naskir ku em di wî halê heyirî de ne, camêr 2 ode li stasyonê dane me. Di herdu odeyan de, bi tenê 3 text hebûn . Lewma, me levkir ku em razana xwe li ser wan textan bikne bi dorê. Piştî ku me çente û menteyên xwe kirne herdu odeyan de, me derî li pey xwe girtin û em derketne derve da em gerekê bidne xwe.

Hê ji mêj ve min dixwest serekî werme Yerîvanê, lê mixabin tu firsendeyên wilo minasib bi dest min ne diketin. Bi ser ku min 5 salan xwendina xwe ya endezyariyê li bajarê "Bako" paytexta Azirbêcanê-

---

<sup>12</sup>-Airo-Flot : Şirketa balafirvaniya Sovyetî.

kiribû, ku sînorên wan herdu komarên Sovyetî digihin hev. Divêt ku ez li vir bînim zimên, 2 sedeman ez dikşandime Ermenistanê. Sedema pêşî, hebûna kurdan bû li wir, ku min dixwest rewşa jiyana wan nasbikim. Sedema didwan, min dixwest welatê cîranên me yên Ermeniyan bibînim.

Gera me ya pêşî li nava sûk û celdeyên Yerîvanê 2 seetan dom kir. Di wê meşê de, me li qesir û qonaxên dîrokî yên bajêr temaşekir. Belê, Yerîvan weke metropolekî kevin, bajarekî xweşe û hêjaye ku mirov were ji xwe re çend rojan li wir bimîne.

Nîrokî, wextê firavînê, em derbasî aşxaneyekê bûn. Li wir me kebab xwarin. Bi rastî kebabên wan xweş bûn. Lê bi xweşbûna xwe, ew tucaran ne digihan wan kebabên ku me li Qamişlo dixwarin. Piştî, em vegerane stasyonê qene em xwe seetekê rehet bikin.

Danê 'esrê, me dîse xwe berda bajêr qene em wasteyeke çûnê ji xwe re bibînin, lê ew bizava me jî boş çû. Em gelekî aciz bûn û me naskir ku rewşa çûn û hatinê di hindirwê yekîtiya Sovyet de yekcar kambax biwe. Wê şevê em di stasyonê de man. Helbet 3 textan têra 5 zilaman nedikirin. Ez bi xwe ne razam, û

ti xew nekete çavên min de. Serê sibihê, zaro rabûne ser xwe, û li bûfêyeke nêzîkî stasyonê me taştêya xwe xwar. Dîse me dest bi bizav û xebatên xwe yên çûnê kirin, lê careke dîtir tişteke bi dest me neket. Vêce em li sûk û celdeyan meşîn heta ku em ji qerem ketin. Di rê ya vegeerê de, me firavînek ji: (nan, kolbesa<sup>13</sup>, bacanê sor, û lemûnada<sup>14</sup>) bi xwe re bire stasyonê da em li wir bixun. Piştî firavînê, me hinekî xwe rehet kir. Dûvre, em derketne derve qene em tişteke ji xwe re bikin. Vêcarê şensê me lêda û me cihên xwe di mikrokeke piçûk de girtin, ku berê wê bi Tiflîsê ve<sup>15</sup> bû.

Ji beriya ez behsa derketina me ji Yerîvanê bikim, ku em roj û dankî li wir mabûn. Wê baş be ku ez 2 gotinan ser tiştên min dîtî û bînayî ji rewşa siyasî, ekonomî, û civakî ya bajêr biaxivim :

Ev hatina me kete demeke zor û çetin de ji dîroka yekîtiya Sovyet. Polîtîka "pêrêstroyka î glasnost<sup>16</sup>", ku

---

<sup>13</sup>Kolbesa: Sicûqên goşt

<sup>14</sup>- Lemûnada : leymûnî (gazoza Sovetî)

<sup>15</sup>-Tiflîs :Paytexta Gurcistanêye.

<sup>16</sup>- Li gorî dîtina "Mîxayîl Gorbeçov", armanca polîtîka "pêrêstroyka î Gilasnost"- siyaseta ji nûve avakirin û hişkere- ew bû:- ku lezê bide geşkirina pirsên ekonomî û civakî li welêt, û wê yekê bike bingeh ji hemû siyasta xwe re . Ew gotin tê wê watê, ku xurtkirina ekonomiya welêt were

sekretêrê giştî yê partiya komûnîsta Sovyet, "Mîxayîl Gorbeçov" ji sala 1985 an ve ajotibû bi ser ne ket û dewleta Sovyetî piço piço ji hev diket, piştî ku her 15 komarên ku ew "Yekîtî" ji wan ava dibû biryara serweriya xwe standibûn û komara Ermenistanê yek ji wan bû.

Bê guman, di wê rewşa aloz ku Sovyet têde bû. Ji alîkî ve, hilweşandina wê dewleta mezin. Û ji aliyê dîtir ve, serxwebûna 15 komarên wê, encamên erênî û neyînî derdiketine holê. Di warê demokrasîyê de: guhertinên giring li wir çêbûbûn. Li Yerîvanê, me guhertinên erênî bi çavên xwe dîtî. Ermenistan li ber hîlbijartinan bû, û saziyên siyasî û civakî xwe ji wê berberiya demokrasî re amade dikirin. Wêne yê

---

danîn ser asasê serketinên zanistî û tekîkî yê herî nûjen. Herwesa divêt ku rêformên Kûr di awayiyên rêvebiriyê de werin pêkanîn. Dîse jî, gereke ku siyaseteke civakî xurt were danîn ji boyî xweşkirina jiyana Sovyetan. Û ew hemû jî ne mumkine ku pêkwere, bêyî tevlîbûna xelkê di kar û barê dewletê û civakê de.

- Di banga xwe de, Gorbeçov behsa guhertinên siyasî û kultûriyên mezin dike. Ew tekez dike ser pêşxistina sosyalîzmê û rizgarkirina welatiyan ji bîrokratîzmê.

-Derbarê têkliyên Yekîtiya Sovyet bi dewletên dîtir re, û li ser pirsra çekên atomiyê –stratîcîk, Gorbeçov wesa dibêje:- Armanca siyaseta me ewe, ku hevkarîyeke navnetewiya fereh pêkwere da em bikaribin nakokî û problêmên ku nav dewletan derkevin çareserbikin. Herwesa pêwîste ku em kar û xebateke mezin bikin ji boyî rakirina xetera çekên atomiyê–statîcîk ji holê û bihêlin ku aştîyeke tekûz û berdewam li cîhanê çêbibe.

nûnerên partiyên ku xwe dabûn pêş ji boyî hilbijartinê bi hêtan ve û li gelek deveran belav bûn. Berê ew prosêsa demokarsiyê tu caran li Sovyet çenebûbû. Lê li gorî wê keyf û şahî û geşbûna ku ji demokrasî û serweriyê re dihate kirin, rewşa Yerîvaniyan di warê aboriyê de ne xweş bû. Me'lûme, dewleta Sovyetî bi rêjîm û saziyên xwe ve (yên siyasî, îdarî, û civakî ve) ji hev diket û Ermenistan parçekek ji laşê wê dewletê bû. Ne bes wilo, lê belê nakokiyên dijwar di navbera millet û komarên Sovyetî de derketbûne holê, û nemaze ew şerê ku di navbera Ermenistan û Azirbêcanê de çêbûbû. Belê bandora wan faktorên neyînî pir xirab bû ser jiyana xelkên paytexta Ermenistanê. Û weke ku tê zanîn: Ermenistan yek ji wan komarên feqîr bû li Yekîtiya Sovyet. Petrol û dewlemendiyên wilo zêde li wir nînin. Li nava sûka Yerîvanê, em pêrgî erebeyên dewaran hatin ku bar li wan bûn. Ji me re gotin: sedema wê yekê, qutbûna petrolêyê ji komarên dîtir. Peryên wan, ango "Rûbilê Sovyetî" gelek ji nirxa xwe winda kiribû. Heke berê nirxa dolarekî emrîkanî dikre 3 rûbilên Sovyetî. Di vê hatina me de, nirxa dolarekî gihabû (30) rûbilî. Ev faktor bi tena xwe xweşik dide xuyakirin çiqasî aboriya xelkê ze'îf biwe.



Di warê civakî de: Ji wê mana me ya kurt li Yerîvanê, me dît ku xelkên bajêr mirovne rehet û qedir nasin. Tiştêkî dîtir jî bala min li wir kişand: Li nava sûkê, me keç û xort, û mêr û jin dîtin ku kincên sipehî û modêl li wan bûn. Ew jî lêva Firansawîyan hej xwe kirî û bi tifrebûn.

Seet 3 yê piştî nîvro bû, gava ku mikroya me, her 5 hevalan û 3 xortên ermenî, girtî ji ber dergihê stasyona tirênê meşî. Piştî ku em ji bajarê Yerîvanê derketin. Şifêrê me berê mikriwê da ser rê ya Tiflîsê.

Mikro ya me li ser rêyeke çiyayî diçû. Ew deverên ku em di nav wan re derbas dibûn, bi kend û kortên xwe ve, hema hema layî xurista gelek herêmên Kurdistanê bûn. Heta dinya rehnîk bû, çavên min di pencera Mikroyê re li derve bûn, û min ji xwe re li wê xurista çiyayî temaşedikir. Qonaxa 2 seetan em çûn. Roj hino hino diçû ava û reşatî dikete erdê de. Piştî ne bi gelekî, yek ji heval-rê yên me yên ermenî li ber gundê xwe peya bû. Herdu hevalên wî yên dîtir, ku xelkên Gurcistanê bûn, çûna xwe bi me re berdewam kirin.

Bi rê de, piştî ku em qedereke dîtir çûn, em rastî Sûrpirîze intêrêsan hatin. Ji nişkave, mikrowa me li ber dergihêkî mezin, ku rê hemû girtibû sekinî.

Min ji yê şifêr pirsî : Ev çi ye?

Wî got: Ev hidûd e!

Vêce Rizo pirsî: Ma hidûd di hidirwê Yekîtiya Sovyet de çêbûne?

Yê şifêr birsiv da, go: Ne xêr, nînin!. Lê belê, ji boyê ewlekarî û parastina xwe, van gundiyan ev dergih ji xwe re li ser vê rê yê danîne.

Rizo dîse pirsî: Vêce, wê çawa be?

Mêrik got: Ne tişteke, emê niha wî hidûdî vekin!

Yê şifêr ji mikriwê peya bû, û nêzîka 5-6 deqîqeyan ji ber çavên me wîndî bû. Dûvre, me dît va wê zilamekî kinikî, çelaxwehrî û şepqe di sera de, bi xwe re anîye.

Yê şifêr got: Ev bekçiyê hidûde. Wê niha dergih ji me re veke!

Qaşo "Bekçiyê hidûd", kilît ji berîka xwe derxist û ew dergih bi 10 rûbilan, ango bi 30 sentê emerîkanî vekir.

Bêguman, tişta me li ber wî "hidûdî" dîtî; komîdyikeke piçûk jê derdiket: Lê bi tenê, ew qaşûla sera sera bû ji problêmê. Di cewher û rastiya xwe de; ew wêneyek ji tiracîdiya milletên Sovyetî bû ku şer û kuştin û agir di nav wan de pêketibû, û nemaze ew şerê ku di nav Ermen û Azirbêcaniya de çêbûbû.

Piştî sekna li ber wî hidûdî, şifêrê me ajot û rêya xwe berdewam kir. Em 9-10 km çûn, yê şifêr got: Em nûka derbasî sînorê komara Gurcistanê bûn. Di wê rêya Tiflîsê de, em ji sûrpirîzan xilas nebûn, piştî ku em ji wî hidûdî derketin bi qedera 2 seetan, di Mikroyê de surpirîzeke ne xweş bi me re der ket. Ji nişkave, herdu xortên ermenî, ku bi me re diçûn. Gotin "Em di tor û bextê we de, ku hûn me ji Azirbêcaniyan biparêzin!".

Yek ji wan herdu xortan hat di neqeba min û Dr. Evdê de rûnişt. Yê dîtir jî çû kete neqeba Se`dûn û Ibrahîm de. Zaro ji dest hilanîn ketibûn, heta ku pesaportên xwe jî radestî me kirin, qene newne naskirin ku ermenîne. Û herwesa, hêvî ji me kirin ku tişteki xirab çêbibe, em wan weke welatîyên Sûriyê bidin naskirin.

Vêce, sedema wê tirsâ zêde ku herdu xort têde bûn; hebûna çend gundên Azirbêcaniyan bûn di wê herêma ku em têre derbas dibûn.

Me herdu xort hedinandin, û me soz da wan ku em nehêlin Azirbêcanî tişteki bi wan bikin.

Piştî ku taze hedinî û rehet bû, xortê ku di neqeba min û Dr. Evdê de rûniştî pirsî: Gelo ma hûn bi çi zimanî diştexilin?

Dr. Evdê gotiyê : Em bi kurdî diştexilin !

Dîse xortê ermenî pirsî : Ma kurd li Sûriyê hene?

Dr. Evdê berisva wî da û got: Belê, kurd li Sûriyê hene!

Qedera seetekê heval-rêyên me yê ermenî korbûn û hew deng ji wan hat. Dûvre wan kara xwe ya peyabûnê kirin. Me pasaport li wan vegerandin, û gava ku mikro li ber gundê wan rawesteha da peyabibin, wan sipasiya me kirin û gotin: Em wê piştgirî û hevsojiya ku we bi me re di wê seeta zor û zehmet de kirî, tucaran ji bîr nakin !

Me xatir ji hevdu Xwestin, û dîse me da rê û em meşîn.

Herdu seet û nivên mayî ji rê ta Tiflîsê, em di deverên asê re gih di hêrikên bilind re, û gih di bestên kûr rebihûrîn.

Seet 11:45 de. Di bin baraneke ku weke lûlika misîn dihat, mikro ya me derbasî Tiflîsê bûbû. Û yekser me berê xwe da stasyona tirênê ya bajêr. Qozê me li Tiflîsê rabûbû. Çawa em gihane stasyonê, tirêna ku berê wê bi "Adlerê"<sup>17</sup> ve bû, xwe amadedikir ji derketinê re. Hema me rahişte çenteyên xwe û em ketine tirênê de. Li hindirû, me şêfê tirênê dît. Ew guncîkî wilo; "qutî, giroverî, sipîçolkî bû". Me pêre bi rûsî da û stand. Mêrik got : Ezê 5 cihan di kûpê<sup>18</sup> de bidme hewe, lê hinekî bi pereyên zêde. Nirxa bîlêtê ji Tiflîsê ta Adlerê bi 15 rûbilan bû. Lê yê şêf, serê nefse doza 50 rûbilî kir. Bê virde- wêde, me qebûl kir. Çiku piştî 5 rojan ji seferê, em ji taqet ketibûn. Dûvre, 50 rûbil ji me re ne gelek bûn. Ew tevde—mevde dibûne dolar û nivêk. Leyse, min û Dr. Evdê û Ibrahîm cihên

---

<sup>17</sup>-Adler : Bajarekî Rûsiye, li ser derya reş dikeve.

<sup>18</sup>-Kûpê : Rêjîmmeke di vagonên tirênê de, ku Kabîneyên wê ((yên razanê) ji hev cuda ne.

xwe di kabînekekê de girtin. Se`dûn û Rizo cihên xwe di yeke dîtir de girtin. Û seet 12 yê nivê şevê, tirêna me ji cih qeliqî.

Weke ku me got: Em ji te'ba felişbûn. Ji lewra, her yek ji me çû ser cihê xwe û em ketne xew de.

Sibiha dîtir, seet li dora 8 an, em ji xew şiyar bûn. Piştî ku me dest û riwên xwe şuştin, me pirsra taştêyekê ji xwe re kir. Li bûfêya tirênê me tiştêkî wilo zêde ne dît. Lewma, çavên me mane li derve- li ser stasiyona ku em bi berve diçûn. Vêce gava tirêna me li wê stasiyonê rawesteha, Ibarhîm û Se'dûn ji vagonê peyabûne xwar da nanekî ji mere bînin .

Herdu hevalên me, Nan, penîr, mast, kolbesa, fêkî, û lemûnada, ji wan pîrek û zilamên pîr ku carê berhemên xwe tînine stasiyonan firotinê kirîn.

Me taştêyêke xweş xwar, û nexasim penîrê wan gurciyan, ku gelek taze hatibû çêkirin.

Piştî wê taştêya nefîs, ez derketime Korîdorê û pencereyek ji wan pencereyên vagonê min anî xwar da ez awirekê bidme derve. Xuristeke xiyalî li ber çavên min ket. Hawîrdor şîn û sipehî bû. Li wê

herêma çiyayî, xaniyên wan gurciyan bi awakî endezyarî xweşik ji tepan çêkirî bûn. Li dora her malekê; çêlekek- didwên firincî diçêrîn. Û heta tirêna me ser erda Gurcistanê çû, Xuristawê hemû; dehil û devî û şînayî bû. Bêguman, Gurcistan bi cihê xwe ye giring li ser derya reş û bi xurista xwe ya şîn; yek ji wan komarên Sovyetî yên herî xweşe.

Girgira tirênê bû li ser rêya hesinî. Ewê şûhek pey şûhekê dida xwe û her û her berê wê bi Adlerê ve bû, ku em hê qonaxa 7 seeta jê dûr bûn. Vêce da em sebra xwe di wê rêya dûvdirêj de bînin, em her 5 heval hatin di kabîna me de rûniştin û me ji xwe re behsa dinyayê kir. Şitexaliyê şitexilî kişand û gotin hate ser têkçûna pêrêstroyka Gorbeçov û nakokiyên di navbera wî û "Borîs Yeltsin"<sup>19</sup>de, ku berê me ew babet bi hev re gelek caran guft ûgo kiribû. Vêcarê em wî babetî di tirênê de û di nav Rûsan de nîqaşdikin.

Min got: Têkçûna pêrêstroykayê, gunihê Gorbeçov bû. Raste wî dest bi karekî hêja kiribû, lê wî di nivê rê de betenaş kir û dev ji hevalên xwe yên retormator gereha û li muhafezekaran vegereha, heta ku ew bi

---

<sup>19</sup>- Borîs Yeltsin : serokê Rûsiya federal bû piştî rûxandina yekîtiya Sovyet.

xwe lê quliptin û bi inqîlaba 19-21 ê tebbaxa çûyî li dijê wî rabûn.

Se'dûn got: Na, gunih yê herdu aliyan bû. Wan ne dikarî bûn nakokiyên di navbera xwede çareser bikin û meselet bû qayîş û berberî di navbera wan de û di encamê de; siyaseta pêrêstroykayê top avêtibû.

Dr. Evdê Hacî “profêsorê edebiyata Rûsî” bi ken got: Ne Yeltsine, û ne Gorbeçove, û ne muhafezekarin. Ew hemû vir û derewan li milletê Rûsê perîşan dikin!

Rizo got: Ka bavo bihêlin em jî kevrê xwe bavêjne wê golê de. Wî û Ibrahîm jî ya xwe gotin, û nîqaşê dirêjkir û bêhtir dengê bilind stand, heta ku rêwiyên nêzîkî me aciz bûn. Lewma, me şitexaliya xwe qut kir û Se'dûn û Rizo rabûn çûne kabîna xwe.

Xelkên Sovyet hej qerbalixa siyasî nakin. Di wan 5-6 salên paşî de, serê wan ji wê xire-cira pêrêstroykayê êşeha bû.

Piştî wê guft û goyê, her yek ji me çû ser cihê xwe. Ez bi xwe hilkişeham ser textê xwe, ku ser yê Ibarhîm re bû û nêzîka 2 seetan em di xew ve çûn. Çaxê firavînê,



em çûne bûfeya tirênê. Li wir me nanek xwar. Tirêna me derbasî sînorê Rûsiya federal bûbû.

Heta Adlerê, hê qedera 3 seetan çûn ma bû. Û seet li dora 4 an em derbasî stasyona Adlerê bûn. Wê 'esrê, dinya li wir sar bû. Yekser me berê xwe da kuleka firotina bîlêtan. Ya me'mûr got: Îro tirên heta Mosko nînin !

Me pêre da û stand û me gotiyê em biyanîne ka tu ji me re tişteki nakî?

Wê jinekê tişteki ne kire destên me de. Û em mecbûr bûn ku em xwe ji ber kulekê bidne paş. Se'dûn ne merdî ne kir û wî êrîş berda ser kulekê. Hew me dît ku pirqênî bi wê jinekê ket. Axirkê, ya me'mûr qayil bû ku 5 bîlêtan heta Xarkovê<sup>20</sup> bide me, lê bi bihakî giran. Wê serê her neferekî 200 rûbil ji me standin. Nirxa bîlêtê heta Xarkovê 50 rûbil bû. Vêce, me ji Se'dûn pirsî : Te çi gote wê hirpê heta ku ew cih dane te?

Se'dûn got: Kurro me pirsin, peyva min lê xweş hat û xilas!

---

<sup>20</sup>- Xarkov : Piştî Kîyêvê, bajarê didwaye li Ûkrayînayê

Neyse, ya girîng ew bû ku me cihên xwe di tirênê de girtin. Hezkî bila heta Xarkovê bejî. Me got çilo be, emê ji wir bikarbin herne Mosko!

Seet 6 ê êvarê, tirêna me ya Xarkovê ji stasyonê qeliqî. Û weke ku ji me re hate gotin: Qonaxa rê ji Adlerê ta Xarkovê 24 seet çûnbûn.

Sefera me ya Xarkovê ne xweş derket. Bi rê de, tirên xirabû û zêdeyî 4 seet û nîvan em rawestehan. Roja dîtir, seet 10:45 deq êvarê, nûka em gihane stasiyona bajarê Xarkovê. Wê seetê, berfeke hûr li wir dibarî. Em derbasbûne hindirwê avayia stasyonê da em ji xwe re bîlêtan ji boyî çûna Mosko peyda bikin. Li wir, bi sedan rêwiyên lêva me hebûn. Bi rastî min bawernedikir ku bîlet li wir bi dest me bikevin. Lê mesele hesanî derket, û me 5 bîlet kirîn bêyî ku em pereyên zêde bidin.

Em hemû ji avayiya stasionê derketin ku em herin li tirênê siwar bibin, ya ku amade bûbû ji çûnê re.

Dr. Evdê, Rizo, û Ibrahîm rahiştne çenteyan û ketne tirênê de, mane ez û Se'dûn. Ji nişkave, 2 mîlîsan<sup>21</sup> em sekinandin, û doza pesaportan li me kirin.

Me pesaportên xwe tevlu vîzeyên Sovyetî dane wan.

Wan mîlîsan li pesaport û vîzeyan meyzandin û meyzandin û dîse meyzandin û pirsên kelevajî ji me kirin û nizanim xwe çilo çawa kirin, lê pesaport li me ne vegerandin!

Me fêhim kir ku çavên wan mîlîsan li peraye, lê me ne xwest ku em tiştêkî bidne wan. Vêce, me gote wan: Ev çi mesela we ye, û hûn dibînin ku tu şik di pesaport û vîzeyên me de nînin?!

Lê wan xwe xaşo-maşo kirin û pesaport li me ne vegerandin.

Me dîse gote wan: Kurro ka wa pesaportan, vaye wê tirên bimeşe!

Lê wan mîlîsan yekcar xwe pîskirin û pesaport ne dane me.

---

<sup>21</sup>- Mîlîs : Polîs

Hew me dît ku tirên ji cih lebitî. Me dengê li wa kir û me got: Kurro kanî wa pesaportan, waye tirên meşî !

Me pesaport û vîzeyên xwe ji nav destên wan derxistin û em pey tirênê ketin. Ez ji Se'dûn bezatir bûm. Çawa ez nêzîkî deriyê vagonê yê vekirî bûm, min xwe pêgirt û ez ketmê de. Lê Se'dûn ma li paş û ne giha tirênê.

Gelekî dilê min bi Se'dûn ve ma, ku bi tena xwe li wê stasyonê ma. Hedara min ne hat. Min rabû yekser berê xwe da şêfê tirênê, û bûyera ku bi mere qewimî min jê re got.

Yê şêf got: Ev tirêna "Bako" we. Ê 20 deq dîtir, wê tirêneke weke vê dîse were vir. Ê xudê heskê, wê hevalê te bi xwe re hilîne !

Yê şêf xebereke xweş gote min, lê dilê min ne kete cih de û ez mame di mitala hevalê xwe Se'dûn de, ku ew cara pêşî bû piştî wê qas rêwêtiyê, em ji hevdu veqetehan .

Ew roja 7 an bû ku em bi rêde diçûn. Em gelekî westeha bûn û me'id bi me ve ne mabû. Riha me

hatibû û ew bûbû heftîk ku me serên xwe ne şûştibûn.

Ez jî weke hevalan çûme ser cihê xwe di wê wagona giştî<sup>22</sup>de. Êşeke zor di serê min de bû. Min xwe li ser têxt dirêjkir da ez binivim. Wext berî nivê şevê bû. 3-4 deqîqe di wê navê re çûn, dengê me'mûrekî tirênê dihat û digot: "Hevalno, Welehî gelek şerme ! Welehî tişta ku hûn dikin kirête! Qey hûn bîrnabin ku hûn di dereke ('am) de ne?!

Mêrik 2-3 caran wilo bakir. Min naskir ku tişteki li derveyê edebê çêdibe "hinek li hinekan siwarin".

Bêhnekê ez şiyar mam, Se'dûn di bîra min de bû. Dûvre xewê zora min bir, û yek şûhê heta sibihê ez razam.

Sibihê ez ji xew şiyar bûm ku seet 8 e. Hevalên min ji xew rabû bûn. Heta Mosko hê 2 seet çûn mabûn.

Dîse me behsa Se'dûn kir. Dr. Evdê got : Tişteki bi Se'dûn nayê: Ew bi salan li Sovyet maye, û zimanê Rûsî dizane . Helbet wê bikaribe xwe bighîne Mosko !

---

<sup>22</sup>- Wagona giştî di tirênê de : Vagoneke hemû li ser hev vekiriyê, bêyî ku kabîneyên cuda têde hebin.

Hê em wilo diştexilîn, keç û xortek di ber me re derbas bûn. Keçik bi sipehîbûna xwe weke stêrkekê ji stêrkên ezmanan bû. Lê xort; yekî bêmirês, rengê sûtal û 'ewareyan lê diket. Zilamekî Rûsî ku nêzîkî min rûniştî bû got: Ev bûn, herdukê ku şevêdîtir ew 'îş dikirin !

Min jê pirsî : Ji dil ev bûn?!

Mêrik got : Erê erê ev bûn. Tu nizanî, vêga ew çi fi'il û finas û kar û marên qaçax dikin?!

Ez dilehayî mam. Ew keçka delal, bi wî zugurd û 'ewareyî re?!

Di wê rêwetiye de, em ji lehdekê<sup>23</sup> derbasî lehdeke dîtir bûbûn. Ê seet 10 ê sibihê, di 3 yê heyva 11 an de, sala 1991 î, tirêna me gihabû paytexta Rûsiya û yekîtiya Sovyet (bajarê Mosko).

Em ji tirênê peya bûn û me çenteyên xwe danîne ser erda stasyonê, û çavên me mane li ser ghiştina hevalê me Se'dûn.

---

<sup>23</sup>- Lehid : Yekşem

Berf<sup>24</sup> li Mosko ne bû, lê sireke dijwar wê sibihê li wir dihat. Ew 6 sal bûn ku ez nehatibûme wir. Di dema xwendinê de, min gelekî hejdikir werme wî bajarî, û bi heftiyên ez di mêhvandariya hevalê xwe yê delal Dr. Evdê Hacî de dimam.

Weke ku şêfê tirinê gotî; derket. Seet bû 10:30 deqe, me dît ku va tirênêk ji wê ve tê. Piştî 10-15 saniyan, “tirêna Bako” ya didwan li ber me rawesteha. Deqîqekek çû yan jî neçû, Se'dûn bi qelafetê xwe ve sax-silamet ji tirênê peyabû. Pir keyfa me hat û dilê me rehet bû. Vêce me çavên xwe li teksiyekê gerandin da em pê herin mala xezûrê Se'dûn. Kes li wê malê ne mabû, çiku xezûr û xesiwê wefat kiribûn. Dr. Evdê Hacî, ji me veqeteha û çû nik zar û zêçên xwe.

Gava em di teksiyê de di nava celde û otostradên Mosko re derbas dibûn, min di dilê xwe de digot: Ev ne Mosko ya berê ye. Raste hê avayî û dayiyreyên hikûmetê di cihê xwe de ne, lê bajar mirûsê xwe dike û madekî gomir li ser rûyê xelkê ye. Ê wekat ew encameke neyîniye ji rewşa ekonomiya xirab ku welat

---

<sup>24</sup>- Herdu rojên pêşî netêde, lê pşitre, berf barî û barî û barî, heta ku Mosko kirasê xwe yê zivistanê yê sipî li xwe kir.

ketibûyê de ! Piştî çarîkekê, em gihane mala "Dyadya Kostya"<sup>25</sup> . Ango mala xezûrê Se'dûn. Berî 6 salan "di sala 1985<sub>an</sub> de", ez hatibûme vê malê. Hingê, wî yixtiyarî bi dilekî fereh ez pêşwazî kiribûm.

Xaniyê Dyadya Kostya, piçûk e. Ew ji 2 odeyan û medbexeke kiçkok û himamokekê saz dibe.

Roja pêşî, em bi paqijkirina xênî û şuştin û veşştinê ve û herwesa bi kirîna xwarin û mûnetê ve mijûlbûn. Di wê rojê de, hevlingê Se'dûn, Saşa û pîreka xwe Nataşa hatne serdana me û hinek hewceyiyên me pêkanîn.

Dîse jî, piştî telefoneke Se'dûn, hevalekî wî yê Felestînî bi navê "Mûfîd Disûqî"<sup>26</sup> , ku pêre li Mosko xwendibû hate nik me. Wî ji me re behsa rewşa kar li Mosko kir, û herwesa wî ji mere dolar guhertne rûbilan.

---

<sup>25</sup>- Dyadya Kostya : Mamê Kostya

<sup>26</sup>- Ji dest pêka hatina me ya Mosko û heta rojên me yên paşî jî li wir, Mûfîd Disûqî ji me re bêrexsîr bû,

Têbînîyek : Ji me her 5 hevalên ku em bi hev re çûbûne Mosko. Pîrekên Se'dûn, Dr.Evdê, û Îbrahîm Rûs bûn, yên min û Rizo, kurd bûn.



Roja dîtir vêce, me pirsarê xwe kir. Bi rêya xortne ku karê bazirganiyê li wir dikirin, me girûpeke biznismênên Rûs naskir. Piştî 2 rojan ji wê naskirinê, wan biznismênan em xwestine ser şîvê di kilûba Îtalî de. Şaxek ji wê kilûbê, xwarin-xane bû. Wan biznismênan masekeke zengîn ji xwarinê ji me re vekirin. Dan û standinê di navbera me de dest pêkir. Me ji wan re behsa şixulê ku em ji ber hatibûne Mosko kir. Ji kinarê xwe ve, wan da xuyanîn ku di warê kolana bîran de tu kar ne kirine. Lê ewê wî babetî dersbikin, û ku derfet hebe wê hevkarîyê bi me re bikin.

Rûniştina me nêzîka 3 seetan domkir. Ji bilî babetê şixul ve, gelek şitexalî çêbû. Me behsa sistema sosyalîst û desthilata Sovyetî kir. Yekî ji wan biznismênan got : Vê sosyalîzmê malik li me xirakir. Ê ew şoreş (şoreşa oktoberê sala 1917<sup>an</sup>) hemû ji Rûsyayê re ne gerek bû !

Min rabû bersiva wî da û got : Ez bawer nakim ku sosyalîzm ta wê derencê xirab be !

Mêrik deynekir û hew deng jê hat. Belkî wî bawer ne dikir ku bersiveke wesa bistîne?

Piştî ku em ji kilûbê derketin, hevalan ji min re gotin :  
Te qenc bi "Çengo" kir !.

Min pirsî : Qey ew bi destekî bû?

Îbrahîm got : Erê bi destekî bû. Ma te lê nederxist?

Ya rastî, min wilo hajê nema. Ji ber ku ew dûrî min  
rûniştî bû. Lê vêce, ez li hevalan ve gerham û min got :  
Erê min bersiva wî da, lê rastiyeke di gotinên wî de  
hebû. Ku şoreşa oktoberê li Rûsiyayê sala 1917<sup>an</sup>  
çênebûbane, belkî impratoriya Rûsî bi awakî normal-  
bê wêqa kuştin û şerê navxwe û koçberiya ji welêt bi  
pêş ve çûbane, û nexasim ku Rûsiya : dewleteke  
mezin, xurt, zengîn, û xwedî zanîn û sin'et bû?!

Ji nişkave, Rizo got : Erê birano! We nanê zengînên  
Sovyetî jî war! Ka vêce wan xelkan ew pere ji kû derê  
çelpandine?

3-4 roj di wê navê re çûn, lê tu bersiv ji wan  
biznismênan ne hat.

Îbrahîm got : Hêviya xwe ji wan maldaran qutbikin.  
Ew şirîkatiyê bi were nakin. Ew li hinekan digerin ku  
ew pera ji wa bikşînin, ne ku bidne wan!

Belkî weke gotina Îbrahîm be, ku ew li hineke dewlemend digerhan?

Belkî jî, tiştê wan di kolek û kolana bîrên avê de nebû, lewma ew bi ser me de ne vegerehan!.

Ew hewildana me ya pêşî bû di warê şixul de. Heke ji wê tiştê bi me re ne derket jî, lê em wilqasî ne rehit bûn. Me nêht bû di rojên pêş de, ku em bizavên xwe yên nû bikin.

Hevalê me Îbrahîm 3-4 rojan ji me veqeteha, û çû serekî bide mala xezûrê xwe li "Bako". Ez û Rizo û Se'dûn mane li Mosko. Di wan çend rojan de, me sebra xwe bi gerê û çûn û hatina nava sûkê tanî. Ez bi Mitro yê diçûme nava bajêr. Yan jî devera ku min bixwesta ez hermê de. Ji wir û pêde, gera min hemû dibû bi meşê. Ez ji meşê re bêtexsîrim, û nexasim di bajarekî weke Mosko de, ku ez hejdikim lê bigerim.

Vêce, cih û deverên ku ez li Mosko diçûme wan ev bûn :

-Meydana sor, Mixaza G.Û.M

-Park kultûrî, ango parka çandê. Ew baxeke mezin e û cihekî 'ecêb xweşe li Mosko. Li wir xelk li ser xwe digerin, û nexasim keç û xort, ku randavûna didin hev.

-Zanîngeha Mosko ya bi navê "Lomonosov". Ew navendeke zanyarî pir girînge li yekîtiya Sovyet û li cîhanê bi giştî.

-Stadiyona Lênîn ya fûtbolê. Gelek caran tîmên Sovyetî û navnetewî li wir bi gokê dileyizin. Ez bi xwe hej werzişê dikim, û berê ez bi gokê dileyiztim. Her wesa, ez li Mosko diçûme derne dîtir. Ew bajarê ku mirov çiqasî lê bigere, mirov jê têr nabe.

### **Rewşa Siyasî û ekonomî li Mosko**

Di dema ghiştina me ya Mosko de, 2 desthilatan ew paytext hikimdikirin: Hê desthilata Sovyetî bi serokatiya "Mîxayîl Gorbeçov" mabû, û ala sor ser serê Kirêmlên çikilandî bû. Lê ew desthilateke, lawaz, ji hevdeketî, û li ber xirêna mirinê bû.

-Desthilata 2<sup>an</sup>: hikûmeta Rûsiyayê bi serokatiya "Borîs Yeltsin" bû, ku banga serweriya xwe hilda bû. Ew desthilat xurt bûbû piştî ku wê derbeya komûnîstên muhafezekar di 19-21 ê tebaxê de

beravêtî kiribû. Lê hêz û taqeta wê desthilatê ne hamberî wan guhertinên siyasî û civakî û ekonomiyên mezin ku li Rûsiyayê çêdibûn. Ewlekarî li paytextê xirek bû, û aboriya millet yekcar kambax bûbû. Di rewşeke wilo aloz de, behreke ne hindik ji xelkê hew karîbûn hewceyiyên xwe yên rojane bikin.

Li Mosko, em rastî nomayiş û xwepêşandanan dihatin. Saziyên siyasî û civakî, bê sehu bi al û lozingên xwe ve derdiketin qad û meydana. Berî her tiştî, wan ji boyî azadî û demokrasiyê û jiyaneke xweştir bandikirin. Herwesa, ew alîgirên Rûsiyake xurt û sirbixwe bûn. Bi tenê, komûnîstan doza imperatoriya Sovyetî dikirin, lê ew ne mabûn hêza serdest di welêt de.

### **Civat û şevbêrkên me li Mosko**

Hevalê me Îbrahîm li Bako dom ne kir. Bi vegera wî re, komika me dîse timam bû. Dr.Evdê Hacî xweş dihatê cem me. Ji mêhvanên ku dihatne nik me : Hevalê me yê kevin "Bavê Nazê" bû. Herwesa, dost û heval û mêhvan zehif bûn. Lewma, civatên me xweşbûn û ta wextekî dereng ji şevê dom dikirin. Di wan rûniştin û civatan de, renga renga babet

divebûn, û gelek pirs dihatne kirin. Me behsa heyamê berê dikir, hinga ku me li Sovyet dixwend. Her yekê ji me behsa zar û zêç û hal û ehwalên xwe dikir. Şev ne diçû ku guft û goyên siyasî di navbera me û mêhvanan de çênebûbane, û nemaze li ser pirs "pêrêstroyka yê" û rewşa dawî li Sovyet. Tu bandora perestroykoyê li ser hevalên me yên Mosko xuya ne dikir. Berûvajî, ew alîgirên rêjîm û stîstema kevin bûn. Herwesa, ew xemgîn bûn ser jevdeketina dewleta Sovyetî !

Hevalê me Bavê Nazê jî wesa difikirî. Wî, ew prosês û guhertinên ku li sovyet çêdibûn bi awakî neyînî dinirixand. Ez bi xwe ji helwesta wî heyirî dimam, çiku di çalakiyên xwe yên hizbî de- di partiya komûnîsta sûrî de-, ew ne alîgirê siyaseta ters û hişk û hola bû.

Sûretekî dîtir jî ji mêhvanan kete ber çavên min. Vêce ew ji nifşa nû bû, ku berê 2 salan xwendina xwe li Mosko biribû serî, û li wir karê bazirganiyê dikir. Tiştê me ji xort fêhm kirî, wî perene baş ji xwe re di wan herdu salan de çêkiribûn, û bi hêvî bû ku kar û ticareta xwe ferehtir bike.

Bêgoman, ew hemû normale, û ji mafê wî xortiyê ku bi rêyeke rewa û durust heta bêje bes, zengîn bibe. Lê ya ne normal ew bû ; ku xorto xwe li ser têkçûna sîstema komûnîst li Yekîtiya Sovyete digriyand !

Rizo rabû gotiyê de: Bibhûre mamoste, lê komûnîzm û ticaret tiştê nabêjin hev !

Xorto hinekî mirûsê xwe kir, lê wî tu ne gote Rizo.

Bêşik, ew nêrîna konservatîv ne ya hemû xortan bû. Hebûn yên ku digotin: Têkçûna rêjîma komûnîst û dewleta Sovyetî ne paşîya dinyayê ye. Gelek dewlet û imperatorî ji beriya hilweşane, wê di paşê rojê de jî hinek hilweşin! Em her 5 hevalên ku ji welêt hatibûn, di warê fêhimkirin û nirxandina siyaseta pêrêstroykayê û wan guhertinên girîng ku li yekîtiya Sovyet û li dewletên sosyalîst li rojhiltê avropayê çêbûbûn, li pêşîya hevalên xwe yên ku li Sovyet mabûn. Vêce, wê baş be ku ez li vir nasnameya hizbî ya me her 5 hevalan bidme xuyanîn :

Ez û Dr. Evdê û Se'dûn û Ibrahîm endamên (Partiya komûnîsta Sûriyê) bûn. Rizo yê Osê, endamê (partiya Hevgirtina Gel) ya kurdî bû.

Em her 5 heval jî ji partiyên xwe derketibûn û me îde hew karê hizbîtiyê dikir.

Ez bi xwe ji partiya komûnîst derketim, çiku hew baweriya min bi Edyolociya Marksî hat. Ê di nêrîna min de: komûnîzm bûbû tiştêkî xiyalî ku ne mumkine pêkwere !

Ka em ji siyaset û edyolociyayê veqerîne ser karê kû em ji ber hatibûne Mosko. Ango ser peydakirina kolekên bîrên avê yê "Artiwazî" : du heftî ser hatina me ya Mosko re derbas bûn bêyî ku em tiştêkî bi dest xwe bixin. Nataşa û Saşa gelekî li ber me diketin. Wan hewldidan ku tiştêkî ji me re bikin qene em destvala ne veqerîne mal.

Nataşa gelekî di ber me dixebitî. Piştî pirs û lêkolînan, wê ragihand ku pêwîste berî her tiştî kompaniyê<sup>27</sup> hevbeş bi Rûsan re were damezrandin û tomarkirin li Mosko.

Me dest bi çêkirin û amadekirina kaxezên xwe kir.

Nataşa her û her arîkar bû. Wê parêzerkî nasê xwe ji me re girt. Pêre pêre, Se'dûn pirsî pisporên kolana

---

<sup>27</sup>-kompaniya : Şirket



bîrên artiwazî kir. Ji bajarê "Kazan" paytexta komara Tataristanê ya otonomî, endezyarekî ciyolociyayê bi navê "Volodya" hate nik me. Wî di warê kolana bîrên avê de bi salan kar kiribû. Volodya 3 rojan di mêhvandariya me de ma. Wî belgeyên baş ser kolekên bîrên artiwazî dane me. Herwesa, wî tekez kir ku dikare 2 kolekan ji Tataristanê ji me re peydabike. Helbet bi pereyên hazir. Û li gorî texmîna wî, her kolekek hêjabû 100,000 dolarên Emrîkanî.

Volodya, mirovekî rûsiyî bi goşt û gewde bû. Di vexwarina vodkayê de ; ew hovekî zilaman bû. Û di her 3 rojên ku li nik mayî, min ne dît ku xew kete çavên wî hirçê Rûsî de. Ez bi xwe seet li dora 12<sup>an</sup> diketim xew de. Rizo û Îbrahîm dimane heta nêzîkî 2ê şevê şiyar. Dima Se'dûn, xwediye malê, ku çenedibû Volodya tenê bihêle, û pêre şevbêrk berdewam dikir.

Ez carê sibihan zû ji xew şiyar dibûm. Vêce sibiha yekem, piştî ghiştina Volodya, gava ez ji xew rabûm ; min dît ku va ew û Se'dûn hê ne razane, û 2 şûşe vodka li ber wane. Şûşekê jê vale bû, û ya dîtir li ber xilasekê bû.

Min rabû ji Se'dûn pirsî : Ev çima hûn heta niha şiyar mane?

Se'dûn got : Ma ez çi bikin? Mêrik na raze ! Ew bê sekin divexwe û hey divexwe !

Min ji Se'dûn re got : Ma ne tu jî pê re divexwî?

Se'dûn got : Erê ez divexum, lê ne nîv ribka wî. Ê ma ez dikarim weke wî vexum?!

Herdu şevên dîir jî bi wî hawayî derbas bûn. Ya rastî min dixwest ku Volodya seetekê berî ya dîtir here. Çiku hevalê me Se'dûn ji hal ketibû, û rewşa malê hemûkî ketibû qelaqê de.

Roja çaran beriya nîvro, Volodya xatir ji me xwestin û rahişte çentekê xwe û bi rê ket çû mal.

Ji kinarê xwe ve, me soz dayê de ku tiştêkî nû bi me re çêbibe, emê xeberê bidnê de.

Parêzerê me, ku mijûl bû bi amadekirina kaxezên kompaniyayê ve, tekezkir ku her tişt wê di nava heftiyekê de hazirbibe.

Ji Rûsan, me Nataşa û Saşa kirin hevparên xwe di damezrandina kompaniyayê de. Dilê me rehet bû ku

kaxezên kompaniya me piço piço çêdibin. Me dîse ji xwe re pirsî. Ji me re gotin ku hûnê bikaribin kolekan peyda bikin, çiku ji beriya we girûpeke Sûrî hat kolek birin û wê niha di warê kolana bîran de li sûriyê dixebitin.

Di heftiya paşîde ji mana me li Mosko, me zor da ger û geştê û rûniştina li rêstoranan <sup>28</sup>, û herwesa kirîna diyariyan ji zar û zêçên xwe re.

Parêzerê me ragihand ku kaxezên kompaniyayê timam bûne. Me kompaniya xwe bi navê : "Vodopad"<sup>29</sup> li Mosko tomar kir. Pêwîst bû ku em wê kompaniyayê li Şamê jî tomarbikin, da em bikarbin li Sûriyê bi awakî fermî kar bikin.

Vêce, me kara vegeza xwe kir. Cih ji me her 4<sup>an</sup> re di teyarê de peyda ne bûn. Bi tenê, bîlêtek ser balafira Airoflot dane me. Gerek Rizo pê vegehabane mal, lê telefonê hat ku xanima min ne rehetê. Lewra, ez berî hevalan vegegame mal.

Piştî vegeza min bi 3 rojan, Îbrahîm û Rizo û Se'dûn bi balafirê ji balafirên wê şirketê gihabûne Şamê.

---

<sup>28</sup>- Restoran : Xwarin-xane

<sup>29</sup>- Vodopad, gotineke Rûsiyê. Wate ya wê bi kurdî :Avrêje.

Me dokûmentên kompaniya xwe li Şamê jî xilaskirin. Lê xilaskirina wan dokûmentan di wîzaretên aboriyê û derve de, ji ber sedema hebûna bîrokratîzm û rotînê, 4 heviv wext xwarin. Paşîkê jî, me kompaniya xwe bi navê " Li Şamê tomarkir. " الشلال<sup>30</sup>

Di wê navê re, me pirs û lêkolînên xwe ser kar kirin. Gerek bû ku em sîponserekî ji xwe re peydabikin. Ango : Em hevparne dewlemend bibînin, da em wan herdu (2) kolekan bikin.

Du maldaran xwe dane pêş ku hevkarîyê bi me re bikin, lê keyfa me ji wan re ne hat û me tu xeber li wan ne vegerand. Em li hevparne saxlem û cîrxweş digerehan. Lê her car kesên wilo peyda nabin.

Wext dibihûrî û tiştêkî nû bi me re ne derket. Ez bi xwe hino hino bê hêvî dibûm, û sirra min di kar de divemirî. Lê her sê hevalên min dixwestin ku tiştêkî bikin, nexasim piştî wê te'b û xisara ku li çûna Mosko bûyî.

Havîn bi ser me de hat, lê em wilo man. Bi tenê, hewlidaneke taybet ya Se'dûn hebû. Ew jî bê encam derket.

---

<sup>30</sup>- الشلال = Vodopad = Avrêj

Mixabin, ew projêya xweşik ku me di ber de ewqa te'b û xisar kirî ne çû serî. Lê di heman demê de, ew ger û geşta ku min û hevalên xwe di wê çûna Mosko de kirî, tu caran ji bîra min naçe. Xweşbûna wê çûnê vêce, bi hebûna wan hevalên saxlem û delal bû. Em hemû dost û hevalên hevên kevin bûn. Herwesa me tevan li Sovyet xwendibû, û me bi zimanê Rûsî dizanîbû. Ew faktorekî girîng û arîkar bû ji wê çûnê re.

Rêwîtiya me hemû, ji destpêkê heta xilasekê; xweş bû. Lê li ber dilê min, herdu rojên pêşî ku em di Kurdistana bakur re çûn, ji wê gerê hemûçkî intêrsantir bûn. Ê ez bêhtir ketibûm bin heybeta welatê xwe yê jorîn de.

Li Ermenistanê : Ango li nik cîranên me yê Ermeniyay, ku me 2 roj li wir qedandin. Heke ekonomiya wî welatî di kirîzeke kûr de bû jî, lê Yerîvan bajarekî xweş bû û prosêsa demokrasiyê-Hilbijartin- destpêkiribû, ku 70 salî di hebûna dewleta Sovyetî de tu caran pêk ne dihat.

Ê em di Gurcistana şîn û xweş re derbas bûn. Ji wir, em çûne Adlerê ser Derya Reş. Ê di rêya Xarkovê re em gihane bajarê Mosko (paytexta Yekîtiya Sovyet).

Nêzîka 4 heftiyan em li Mosko man, û me rojne xweş li wir qedandin. Lê Mosko ne mabû Moskoya berê; ku hizbekê bi tena xwe û bi awakî hişk û hola ew hikim dikir. Mosko ketibû dema guhertin û guhestinan de, û civîn û xwepêşandan li darbûn. Piştî vegeza me bi 2 heftiyan, yekîtiya Sovyet ku bê vîna milletên wê çêbûbû, hilweşeha.

Belê, çûna me ya Mosko di demeke wesa girîng re derbas bû. Me gelek dît û me bîna, û me bak ji ber serê xwe berda !



